

Waksînekirina parastina li hemberî Mejûtevna (Meningitis) Koma C (Bi saya waksena cotkirî anku dudukî)

Menjûkok (Meningococci) (Neisseria meningitides) baktrî ne. Heta niha 13 cûre Sêrotîpsên (serogroups) cûrebicûr hatine naskirin. Cûreyên Sêrotîpsên A, B, C û W hokarên nexweşiyên pêgir (epidemics) ên cîhanî ne. Her salê nêzikî 300 heta 400 kes ji xelkê Almanê ku piraniya wan tezezarok, zarokên ku diçin dibistanê û nûciwan in ji ber ufûnet û aloziya giran a Mejûtevne serî li doxtor didin. Hema bêje ji sedî 70'ê van nexweşiyên li Sêrotîpa B ne û ji sedî 20 heta 30'ê nexweşiyên li Sêrotîpa C ne; Ev amara têkildarî heyama berî waksînasyona Standard jibo zarok û nûciwanan bûye (Niha hema bêje gihîştîye ji sedî 16'ê). Waksena dijî nexweşiyên Sêrotîpa B ji dawîya sala 2013'an va li ber destan bûye. Her çend ku waksena ku li vir li ser wê behs tê kirin tenê têkildarî Sêrotîpa C ya Nexweşiya Mejûtevne (Meningitis) ye .

Menjûkok ji kesekî/ê bo kesek din bi riya hewayê hawîrdor tîne guhestin (Pêketina dilopîn). Ewna dikarin nexweşiyên êrîşker ên giran pêk bînin (Ku li ser tevayê lêş bandor dikin); Cûreya herî nasyar a wan Mejûtevna Çîrkî ye (Hulbûn û şewata perdeya mejî) û ufûnet û aloziyên ku jiyana kesê/a nexweş dixin ber gefan. (Jehrîbûnên Xwînî). Nexweşiya Mejûtevne (Meningitis) ji nişkê va diqewime û bi germbûna zêde ya lêş, vereşîn, serêşên giran û hişkbûna masûlkeyên ustî va hevrê ye. Renge mirov tûşî tevliheviya pergala esebî û felecbûnê jî bîne. Ev nîşane li zarokên temenkurt bi giştî taybetmendiyên berbiçav pêk naynin. Heyama nexweşiyên ufûnî mîna Mejûtevne ye; Eger çî ku nexweşiyên ufûnî bi pêşketina berbiçav a nexweşiyê kivş dibin. Xwînrijîna postî ji nîşaneyên pêşketina giran a nexweşiyên êrîşker e. Li babetên ku alozî û kulbûn zêde be, di heyama çend saetan wê bibe sedema mirinê. Ji hokarên xapînok li nexweşiya Mejûtevna êrîşker a şikbar, rakirina lezgin bo beşa baldariyên taybet e; Renge bikaranîna dermanên Antîbiyûtîk jibo dermankirina berî rakirina bo nexweşxaneyê jî ji van hokaran be. Lê heta dermankirina li ser wextê jî hertim rê li ber mirin û ziyarên daîmî yê giran nagire (Ziyana pergala esebî ya navendî, birrîna endamekî lêş ji ber ziyana giran a pêkhatyekê). Hema bêje ji sedî 10'ê nexweşên muhtela bi alozî û ufûnetên Mejûtevne (Meningitis) jiyana xwe ji dest didin û ev yek li Sêrotîpa C ji hemiyar zêdetir e. Lewma êminkirin kiryareke pêşgirane ya teqez û pêwsîst e .

Waksen

Waksen pêkhatiyek ji dîwareya silûlî ya baktriyayî (oligosaccharides, polysaccharides) ya Patûjin (Pathogen) e. Ev waksen tenê li hemberî ufûnet û aloziyên mejûtevne yê Sêrotîpa C lêş (Bedenê) diparêzin û dikare ji temenê 2 mehî û pêde were bikaranîn. Li zarokên li ber metirsiyê di sala yekem a jidêbûnê 1 an 2 waksen tîne lîxistin, ku girêdayî bi waksenê û temenê bikaranîna wê ye. Zarokên bi temenê zêdetir ji yeksalî, nûciwan û kesên mezinsal tenê carekê waksenê werdigerin. Heke êminkirina seretayî di yeksaletiyê da destpê bibûya, pêşniyar tê kirin ku di dusaletiyê da wakseneke xurtker were lîxistin.

Ev waksena bi riya têrekirina ji riya masûlkeyan pêk tê. Doxtorê/a te dikare li bara dema destpêkirin û dewreya baldariyê ku waksen ji te ra pêk tîne ji te ra rave bike. Li ser esasa zanyariyên heyî, ti şîret û pêşniyarek jibo waksenên xurtker nehatiye kirin (Sa dîtina mijarên taybet û kêmnas serî li beşên jor bide).

Waksînekirina li hemberî Nexweşiya Mejûtevna (Meningitis) C dikare hevdem digel waksena din be; Lê li ciyên cûrebicûr tê lîxistin (Wek mînak: Hêtê rast û çepê, Baskê Çep û rastê) ; Dema waksînasyona hevdem li ser tamilkirin û karlêkta wê bandora nerênî danayne. Doxtorê/a te li bara mijarên kêmnas û taybet li vî warî da digel te diaxive.

Çi kes gere werin waksînekirin?

Li gorî teqewîma waksînasiyonê waksena êminkiirna li hemberî Mejûtevna Cûreya C bi qaseke (Doz) taybet a waksenê jibo hemî zarokên dusalî tê kişvkin. Li gorî nêrîna Taxima Hertimî ya Êminkirinê (STIKO), her opêrasiyona waksînasiyona ku li gorî dema diyarkirî pêk neyê, divê dema ku ev kes gihîşte 18 saletiyê, wê waksenê lêxine.

Li gorî qanûnê gist zarokên mezintir ji dumehiyê, nûciwan û mezinsalên ku doxtorê/a wan daxwaz an îzna waksînekirina wan bide, dikarin waksîne bin. Ji bilî viya STIKO waksînasiyonê bi taybet jibo kesên ku li ber xetera giran a ufûnet û kulbûnê an dûhatên wê ne, kişv dike. Bi taybet jibo wek mînak kesên bi kêmbûna êminiyê an bêyî Fatereshk an Fatereshka Bêçalak herî zêde li ber gefan in. Waksenên çarnirxî ku laşê meriv li hemberî komên din ên Mejûtevnê (Meningitis) (A, C, W û Y) diparêzin her viha rege waksena Mejûtevna Cûreya B gere li ser wan kesan bê ceribandîn. Kedkarên ceribandinxaneyê jî ku li ber gefê ne, divê li hemberî van komên Mejûtevnê bîn waksînekirin.

Li kêleka Pêşîlêgirtina Dermanî (Bi antîbiyûtîkan) kesên nêzikî nexweşan jî gere di yekem derfeta pêkan da waksîne bibin. Heke alozî û ufûnetên mejûtevnî yên têkildarî Cûreya C li navçeyekê an li civaka Almanê berbelav bibin, rege berpîrsên saxlemiyê bangewaziyekê jibo êminkirinê biweşînin da ku bi vî rengî rê li ber berbelavbûna nexweşiyê bê girtin. Zarokên ku diçin dibistanê û xwendekarên ku jibo dewreyên demdirêj li welatên din dimînin û li wan welatan êminkirina li hemberî Mejûtevna Cûreya C bi giştî an jibo vê koma temenî ya taybet pêk tê, divê waksîne bibin. Ev waksena her viha jibo sefera bo welatên ku li wir berpîrsên saxlemiyê ji ber berbelavbûna herêmî ya nexweşiyê bi awayê demkî vê waksenê kişv dikin jî gere pêk were. Pêkanîna waksenên çarnirxî (A, C, W û Y) jibo kesên ku sefera navçeyên Mejûtevnê têda berbelav bûye dikin û peywendiya wan a nêzik digel gelheya herêmî heye, tê pêşniyarkirin. Wek mînak ev waksena jibo rêwiyên seferên ziyaretî (Hecîtî, Heca Umreyê) bo Erebistana Siûdî an sefera bo navçeyên mejûtevnî li Afrîqayê tê sepandin.

Kî divê waksînasiyonê pêk neyîn?

Kesên ku nexweşiyê giran bi wan ra ye û hewcedara dermankirinê ne, nabe ku vê waksenê bi kar bînin. Kesên ku hestiyariya wan li hemberî hêmanên pêkênerên waksenê heye jî nabe ku bi vê waksenê werin waksînekirin .

Eger çî ku tu nîşaneyek ji bandorên nerênî yên vê waksenê li heyama pêgiraniya jinan nehatiye ragihandin; Lê feyde û xeterên waksena Mejûtevna Cûreya C jibo jinên ducanî divê bi awayekî tam û kamil werin hilkolandin. Heke pîrseke te hebe, şexsê/a waksîneker dê bersiva pîrsên te bide.

Baldariyên piştî waksînekirinê

Eger çî ku kesên waksîne dibin hewcetiya wan bi baldariyêke taybet tine; Lê gere kesê/a ku waksîne dibê xwe ji zext û zorên fîzîkî heta sê rojan piştî waksînasiyonê dûr bike. Lewma gere doxtor berî waksînasiyonê li bara kesên ku bertekên dil û tamaran dîtine an ji mêj va duçarî Hestiyariyên Tund ên Gavkî (Cûreya 1) bûne, were agahkirin.

Bertekên ihtimalî û giştî piştî wergirtina waksenê

Li gorî lêkolînên pêkhatî piştî êminkiirn û parastina li hemberî nexweşiyê, piştî waksînekirinê pîrîcaran rege sorbûn, hestiyariya li hemberî zextê û perçiftin û werimîna êşbar pêk werin (Ji sedî 10'ê kesên ku hatine waksînekirin). Ev bertekêke asayî ya gewdeyê mirov li hemberî waksînekirinê ye ku bi giştî ji 2 heta 3 rojan didome û dewama wê zêdetir ji sê rojan kêman caran diqewime. Li babetên kêmdîtî dê ev bertekên giştî yên bedena mirov girantir bibin ku sistbûn û bêtevgeriya bedenî jî bi xwe ra tine. Her viha di heyama 1 heta 3 rojan (Û kêmtir caran zêdetir ji wê heyamê), ji sedî 1 heta 10'ê

kesên ku waksîne bûne renga nîşaneyên giştî tecrube bikin ku ev nîşane zêdebûna germiya laşê mirov heta 38 dereceyên santîgradê (Kêmtir caran heta 39.5 dereceyên santîgradê), xewokbûn, bêxewî an pirsgirêkên xwarin û mehandinê (Dilrabûn, Vereşîn, Vijik) û bedxulqiyê (Li zarokan) digire ber xwe. Serêşan her viha êş an nerehetiya masûlke û jûnî û mefselan jî di rêza van nîşaneyan in. Normal e ku bertekên navbirî demkî ne û bêyî ku her cûre dûhatekê bi xwe ra bînin, bilez ji holê radibin.

Gelo piştî waksînasyonê îmkana her cûre pêkhatina dûhatan heye?

Dûhat û bandorên nerênî yê piştî waksînekirinê ji dûhatên kêmdîtî yê eminkirinê ne ku asta xwezaiya bertekên piştî waksînasyonê derbas dîkin. Bandor û karlêkta wan a nerênî ewqas heye ku saxlemiya kesê/a waksînekirî têxin ber metirsiyê. Kêmtir caran eminkirina pergala bedenê bi saya waksena Mejûtevna (Meningitis) Cûreya C dikare hestiyariyên çermî pêk bîne (Wek mînak: Cûş û pizûng, xurîn, kehîr û sorbûna çerm) an hin hestiyariyan li rêka bêhnkişandinê pêk bînin ku li babetên taybet dikare şoke û behicandinê çêbikin. Li babetên taybet germbûn û şokeya hevrê digel zêdebûnan germiya bedenê li teazarok û zarokên temenkurt tê dîtin ku wek rewşeke normal û bêyî her cûre dûhatên xerab tê naskirin. Babetên kurtedem û şokebar hevrê digel sistî û bêşiyانبûna endamên lêş ku bilez û bêyî ku dûhateke xerab li pey xwe bihêlin ji nav terin jî di rêza babetên taybet tî zanîn .

Têbîniyên têkildarî dûhatên din ji aliyê waksîneker/ê

Wek kesê/a ku vê belgeya zanyariyan tijî dike, doxtorê/a te civînekê jibo wergirtina zanyariyan ji te ra pêşniyar dike. Kesê/a waksîneker jî wê li ber destan be û dê ligel te li bara çawaniya rûbirûbûna bi nîşaneyên girantir li bercî babetên navbirî yê giştî û bertek û dûhatên giştî ku li beşa jorîn hatin gotin, biaxive.

Tu dikarî digel waksînekerê/î peywendiyê bigirî:

Jêstandina berpirsiyariyê

Wergerandina nuxxeya sereke ya belgeya zanyariyan (Nusxe: 04/2016) li ser îzna Robêrt Koç (Robert Koch) û bi îzna ji Saziya Xaça Kesk a Almanê (*Deutsches Grunes Kreuz e.V.*) va pêk hatiye. Teksta almanî pêbawerkirî ye. Tu berpirsiyariyek li bara şaşitiyên wergerandinê her viha birojbûna vê wergerandinê li bernberî venihêrînên din ku li nav tekstê bi zimanê almanî pêk hatiye, dê neyê qebûlkin.

Nav

Name

Êminkirin û ewlehkirina li hemberî Mejûtevna Cûryea C (Bi saya waksena cotkirî)*Schutzimpfung gegen Meningokokken C – mit Konjugatimpfstoff*

Belgeya zêdek belgeyeke zanyariyan jibo agahiya li bara şewaza pêkanîna opêrasyonê waksînasyonê li hemberî Menîjîta Cûryea C ye. Ev belgeya zanyarî û hûngiliyên pêwsît li bara nexweşiyên ku bi riya waksînasyonê va pêşiya wan dikare bê girtin, digire ber xwe; Waksen, Waksînekirin, Baldariyên Piştî waksînekirinê û bertekên piştî waksînekirinê û dûhatên piştî wê.

Anliegend erhalten Sie ein Merkblatt über die Durchführung der Schutzimpfung gegen Meningokokken C. Darin sind die wesentlichen Angaben über die durch die Impfung vermeidbaren Krankheiten, den Impfstoff, die Impfung, das Verhalten nach der Impfung sowie über Impfreaktionen und mögliche Impfkomplicationen enthalten.

Berî pêkanîna waksînasyonê ev zanyarî tèn xwestin:

Vor der Durchführung der Impfung wird zusätzlich um folgende Angaben gebeten:

1 .Gelo wergirê/a waksenê niha ji hêla saxlemiyê va tam tendirust e?

Ist der Impfling gegenwärtig gesund?

Erê (Ja)

Na (Nein)

2 .Gelo wergirê/a waksenê hestiyareke naskirî heye?

Ist bei dem Impfling eine Allergie bekannt?

Erê (Ja)

Na (Nein)

Heke bersiva te Erê ye, ji kerema xwe rave bike: _____

wenn ja, welche

3 .Gelo wergirê/a waksenê di dema lêxistina waksenên berê nîşaneyên hestiyarî, germbûna zêde an bertekên din ên neasayî nîşan dane ?

Traten bei dem Impfling nach einer früheren Impfung allergische Erscheinungen, hohes Fieber oder andere ungewöhnliche Reaktionen auf?

Erê (Ja)

Na (Nein)

Heke dixwazî zanyariyên zêdetir li ser êminkirin û ewlehkirina li hemberî nexweşiya Mejûtevna Cûryea C (Bi riya waksena cotkirî) bi dest xîni dikarî ji waksînekerê/î bipirsî!

Falls Sie noch mehr über die Schutzimpfung gegen Meningokokken C – mit Konjugatimpfstoff – wissen wollen, fragen Sie den Impfarzt!

Ji kerema xwe dema jibo waksînekirinê têtî berborî û belgeyên xwe yên!

Zum Impftermin bringen Sie bitte das Impfbuch mit!

Ragihandina Rezamendiyê*Einverständniserklärung***waksînekirina parastina li hemberî nexweşiya Mejûtevna Cûryea C (Bi riya waksena cotkirî)***zur Durchführung der Schutzimpfung gegen Meningokokken C – mit Konjugatimpfstoff*

Navê wergirê/a waksenê _____
Name des Impflings

Rojbûn _____
geb. am

Min naveroka vê belgeyê xwendiyê û têgihîştîme û bi awayê kesane û bi hûngilî digel doxtorê/a xwe li bara waksînekirinê axivîme.

Ich habe den Inhalt des Merkblatts zur Kenntnis genommen und bin von meinem Arzt/meiner Ärztin im Gespräch ausführlich über die Impfung aufgeklärt worden.

- Êdî tu pirsî min tine
Ich habe keine weiteren Fragen.
- Ez waksînekirina pêşniyarkirî li hemberî nexweşiya Mejûtevna Cûryea C qebûl dikim.
Ich willige in die vorgeschlagene Impfung gegen Meningokokken C ein.
- Ez hez nakim waksînasîyonê pêk bînim. Ez li bara zîyanên ihtimalî yê waksînekirinê hatime agahkirin .
Ich lehne die Impfung ab. Über mögliche Nachteile der Ablehnung dieser Impfung wurde ich informiert.

Nêrîn _____
Vermerke

Şûn , Roj _____
Ort, Datum

 Îmzeya wergirê/a waksenê an îmzeya sergêrê/
Unterschrift des Impflings bzw. des Sorgeberechtigten

 Îmzeya Doxtorê/
Unterschrift des Arztes/der Ärztin